# 73. Di Temayên Destana Kela Dimdimê da Kurdînîya Îdeal[1]

**Yaşar KAPLAN[2]**

**APA:** Kaplan, Y. (2023). Di Temayên Destana Kela Dimdimê da Kurdînîya Îdeal *RumeliDE Dil ve Edebiyat Araştırmaları Dergisi*, (34), 1235-1252. DOI: 10.29000/rumelide.1316386.

## Kurte

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn yek ji girîngtirîn destana edebîyata kurdî ya devkî ye. Ev destan ji alîyê dengbêjan ve li ser rûdaneke dîrokî hatîye honandin. Mijara vê destanê şerê di navbera Kurdên Biradostî û Dewleta Sefewî ye ku ev şer di navbera salên 1609 û 1610ê da qewimîye. Wisa dîyar e ku vî şerî karîgerîyeke mezin li ser kurdan hiştîye, lewra ev destan ji alîyê xelkê ve gelek hatîye bergermkirin û guhdarîkirin. Ji bilî belavbûna wê ya di edebîyata devkî da herwisa rengvedana wê di edebîyata kurdî ya klasîk da jî çêbûye û hinek edîbên kurd li ser vê destanê berhem dane. Ev destan ji sedsala 19an şûnda bûye mijara gelek vekolînên ji alîyê vekolerên bîyanî û xuyanî ve hatine encamdan. Ji deverên cuda cuda gelek varyantên vê destanê hatine tomarkirin. Di vê nivîsarê da varyantên ji devera Hekarîyan hatine tomarkirin wekî numûne hatine hilbijartin. Her çend ev varyant ji devê deh dengbêjên cuda hatibe berhevkirin jî ji ber wekhevîya varyantan, hemî varyant wekî yek varyanta têkûz hatîye lêkdanê. Armanca gotarê destnîşankirina temayên sereke yên destanê û dîyarkirina rengvedana wan a li ser derbirîna kurdînîya îdeal a di destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn e.

**Peyvên sereke:** Kela Dimdim, Xanê Lepzêrîn, beyt, tema, hemaset

# Dımdım Kalesi Destanı'nın Temalarında İdeal Kürtlük

## Öz

Dımdım Kalesi ve Altın Kollu Han destanı sözlü Kürt edebîyatının en önemli destanlarından biridir. Bu destan dengbejler (halk ozanları) tarafından tarihi bir olay üzerine örülmüştür. Destanın konusu Bıradosti Kürtleri ile Safevi Devleti arasında 1609-1610 yılları arasında yaşanan bir savaşa dayanmaktadır. Öyle anlaşılıyor ki bu savaş Kürt toplumunu derinden etkilemiş ve bundan dolayı bu destan halk tarafından oldukça beğenilmiş ve dinlenmiştir. Onun sözlü edebîyattaki yaygınlığının yanı sıra destan Klasik Kürt Edebîyatı'nda da yansımasını bulmuş ve bazı Kürt edipleri onun üzerine eserler kaleme almışlardır. Bu destan 19. yüzyıldan itibaren yerli ve yabancı araştırmacılar tarafından yapılan birçok incelemenin konusu olmuştur. Değişik bölgelerden bu destana ait birçok varyant derlenmiştir. Bu makalede Hakkâri bölgesinde derlenen varyantlar örnek olarak seçilmiştir. Bu varyantlar her ne kadar on ayrı dengbejden derlenmişse de varyantların birbirine benzerliği ve yakınlığından dolayı mürettep tek bir varyant şeklinde ele alınmıştır. Makalenin amacı destanın başat temalarını belirlemek ve bunların Dımdım Kalesi ve Altın Kollu Han destanında kurgulanan ideal Kürtlük üzerindeki yansımalarını ortaya koymaktır.

**Anahtar kelimeler:** Kela Dimdim, Xanê Lepzêrîn, beyt, tema, hemaset

[1] Bu çalışma yazarın 2015 tarihinde tamamladığı Yüksek Lisans tezinden üretilmiştir.

[2] Dr. Öğr. Üyesi, Hakkari Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi, Felsefe ve Din Bilimleri ABD, Dinler Tarihi Bölümü, (Hakkari, Türkiye), yasarkaplan111@gmail.com, 0000-0002-3960-0201 [Araştırma makalesi, Makale kayıt tarihi: 25.04.2023-kabul tarihi: 20.06.2023; DOI: 10.29000/rumelide.1316386]

## Ideal Kurdishness in the Themes of the Dimdim Castle Epic

**Abstract**

The epic of "Dimdim Castle and the Golden-Armed Khan" is one of the most important epics in kurdish oral literature. This epic was fictionalized by the dengbejs (folk poets) based on a historical event. The subject of the epic is based on a war that took place between the Biradosti Kurds and the Safavid Empire between 1609-1610. It is understood that this war deeply affected the kurdish community, and therefore this epic was listened to with great admiration by the people. In addition to his popularity in oral literature, reflections of his work have also been found in classical kurdish literature, and some kurdish literary figures have written works based on his legacy. This epic has been the subject of many studies conducted by both domestic and foreign researchers since the 19th century. This epic, which has many variants compiled from different regions, has been exemplified in this article with the variants collected from the Hakkari region. Although these variants were compiled from ten different dengbejs, due to the similarity and proximity of the variants to each other, they were modestly combined as a single variant. The aim of the article is to determine the main themes of the epic, and their reflections on the ideal Kurdishness fictionalized in the Dimdim Castle and Golden-Armed Khan epics.

**Keywords:** Dimdim Castle, Golden Armed Khan, bayt, theme, heroism

### Destpêk

Destan yek ji cûreyên vegêranê (narrative genres) ê dirêj e ku danêrê wê nahêt zanîn û wekî malê gelekî tête qebûlkirin. Karasoy di nivîsa xwe ya derbarê pênaseya têgeha destanê da ji gelek pisporên bîyanî û xuyanî neqlan dike û di dawîyê da hêmanên hevpar ên pênaseyên têgeha destanê wiha rêz dike. Li dû nirxandina wî hêmana sereke ya ji hemî pênaseyên destanê tête derxistin hêmana qehremanî û mêrxasîyê ye. Ji bilî vê hêmana sereke derasayîbûna kes û rûdanan, vegêrana serbora kesekî an netewekê, hebûna hesta netewî û vegêrana bi awayekî menzûm jî lê zede dike (Karasoy, 1991: 39). Destan bi vehewandina motîfên mîtolojîk û efsanewî ve her çiqas nêzîkî mît û efsaneyan bête dîtin jî di binyat da herdû cûre ji hev cuda ne. Cûreyê destanê li ser hemaset û mêrxasîyê tête vehandin û di hîsîyata guhdaran da hesteke hemasî diafirîne (Keskin, 2019: 177, 187-189). Vegêrana menzûm a Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn bi naverok, tema û motîfên xwe ve hemî şertên destanên netewî li xwe vedigire û ji ber vê çendê yek ji girîngtirîn destana netewî ya kurdan tête qebûlkirin (Kaplan, 2022; 290; Hassanpour, 1995: 404-405). Ev destana netewî ji ber ku li ser rûdaneke dîrokî hatîye afirandin, ji bo cara pêşîyê ji alîye berhemên dîrokî ve behsa vê serhatîyê hatîye kirin. Taybetî kronîkên Îranî yên wekî "Tarîx Alem Arayî Ebasî" ya Îskender Beg Munşî (m. 1635), "Tarîxî Ebasî" an jî ""Rûzname-î Molla Celal" a Celaleddîn Muhemed Yezdî (m. 1620), "Rewzetû's-Safewîye" a Mîrza Beg Cûnabadî û "Efdelû't-Tewarîx" a Fezlî Beg Hûzanî bi berfirehî behsa rûdana dîrokî ya Kela Dimdimê kirine (Açar, 2019; Nêrweyî, 2019). Ji bilî van kronîkên Îranî, Feqîyê Teyran menzûmeyek li ser Kela Dimdim nivîsîye. Ev menzûme ji şêst û heft malikan pêk tê û destxeta wê bi rêka arşîva Alexander Jaba hatîye parastin (Teyran, 2014: 149-159; Sadînî, 2012: 383-397). Wisa xuya dike ku menzûmeya Feqîyê Teyran kêm e. Lê belê şerê Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn her çend bûbe mijara dîrok û edebîyata klasîk a kurdî jî, vê rûdanê werara xwe ya esasî di edebîyata kurdî ya devkî da wergirtîye û bûye destaneke netewî.

Destana mijara gotara me, navê xwe ji çîya û keleyeke li wî çîyayî wergirtîye. Ev çîya û kele dikeve başûrê bajarê Ûrmîye û 18 km'an jê dûr e. Vê destana netewî mijara xwe ji rûdaneke dîrokî wergirtîye. Ev rûdan

ji şerekî domdirêj ê di navbera kurdên Biradostî û Dewleta Sefewî pêk têt. Biradostî li hemberî Dewleta Sefewî di pêşengîya Xanê Lepzêrîn (Emîrxanê Biradostî) da ji bo parastina xak û serbixwetîya xwe Kela Dimdim ava kirine û tê da berevanîya xwe kirine. Kela Dimdim ji alîyê hêzên Sefewî ve di payîza sala 1609ê da hatîye dorpêçkirin û ev dorpêç heta havîna sala 1610an dewam kirîye. Di vê dorpêçê da kurdan bi awayekî mêrxasî heta yek jê nemayî şer kirine. Lehengê vê destana netewî mîr û rêberê Biradostîyan yê wê serdemê Emîrxanê Biradostî ye. Kronîkên Îranî navê wî wekî Emîrxanê Biradostî an jî Emîrxanê Çolaq bi nav dikin (Kaplan, 2019: 21-22;Açar, 2019: 20). Lê belê li dû varyanta destanê ya mijara gotara me, navê wî yê esasî Ûmer e û ew di destanê da wekî Xanê Lepzêrîn, Xanê Zêrîndest, Xanê Çengzêrîn, Xanê Kurdan, Xanê Sor, Mîrxan û Xanemîr tête binavkirin (Kaplan, 2019: 31-32). Wekî ji nasnavên wî dîyar dibe destê wî hatîye birîn û li şûna deste wî yê birî, destekî zêrîn hatîye çêkirin. Kronîkên îranî wisa didin xuyakirin ku Emîrxanê Biradostî dema hevalbendê Mîrê Soran Ûmer Begê beşdarî şerekî bûye û di wî şerî da destê wî hatîye birîn lewra wekî Emîrxanê Çolaq hatîye naskirin. Lê belê li dû destana gelêrî dema ew hevalbendê Şah Ebasê Sefewî (m. 1629) di gel wî çûye nêçîra şêrekî û şêrî destê wî jê kirîye. Ji ber vê mêrxasî û cesareta wî Şahê Îranê destekî zêr ji bo wî çêkirîye û navê Xanê Lepzêrîn lê kirîye (Kaplan, 2019: 22, 33). Lehengê din yê bi navê Ebdal Begê Mukrî jî yek ji mezinên eşîreta Mukrî ye û hevalbendê Xanê Lapzêrîn e. Ew di bizava bergirîya Kela Dimdim da di gel Xanê Kurdan bû û heta dawîyê şer kirîye. Ev rûdana dîrokî wekî li jorê jî hatîye behskirin ji alîyê gelek kronîkên Sefewî û Îranî ve hatîye vegêran (Açar, 2019; Nêrweyî, 2019). Mêrxasîya kurdan a di vê rûdana dîrokî da karîgerîyeke mezin li ser civaka kurd kirîye. Dengbêjên kurd destaneke dirêj li ser vê rûdanê vehandin û ev destan bi naveroka xwe ya tijî hemaset û mêrxasî û bi şêwaza xwe ya revanbêj ve di nava kurdan da gelek belav bû û kete li ser zar û zimanê xelkî. Mela Mehmûdê Bazîdî di vê barê da wiha dibêje: "Ev qezîya şerê Kela Dimdim qewî meşhûr û me'rûf e di Kurdistanê da. … Ekserê Kurdan wê destanê di meclîsan da dixwînin û ji boyê şehîdêd Kela Dimdimê heyf dixwen û digirîn û duayê dikin" (Bazîdî, 2010: 117).

Xebatên li ser destana Kela Dimdim ji nîva duyê ya sedsala 19an were dest pê kirine û heta niha bi dehan varyantên vê destanê hatine berhevkirin û çapkirin. Derbarê vekolerên li ser destana Kela Dimdim xebitî û berhemên wan da mirov rastî hejmareke zêde ya vekoler û xebatan tê (Zîlan, 2015: 193-195; Kaplan, 2019: 16-18; Açar, 2019: 153-157). Varyanta destana Kela Dimdim a ji bo vê xebatê wekî bingeh hatîye qebûlkirin ji devera Hekarîyan hatîye berhevkirin. Ev varyant bi 'eslê xwe ji devê deh beytbêjên cuda hatîye wergirtin. Ji van deh beytbêjan pêncan ev destane bi awayekî têkûz û dirêj vegêrane. Pênc beytbêjên mayî hema tenê hinek ta û çiqên vê destanê dizanîn. Lê belê ji ber ku ev beytbêj hemî yên deverekê ne, varyantên wan hema hema wekî hev in û bi şiklekî hevdû temam dikin, hemî varyant wekî yek varyant hatîye sazkirin. Ferqa sereke ya di navbera varyantan di kurtbûn û dirêjbûna wan da derdikeve meydanê. Wekî yek varyant sazkirina destanê ve hemî hûrgilîyên destanê di nav varyanteke têkûz da hatine komkirin û bi vî awayî naverok û rûxsarê destanê baştir xuya bûye (Kaplan, 2019: 12-13, 18-20).

Tema di vegêranên edebî da hîs û hest an jî boçûn û hizra sereke ya ku tê xwestin bê ragehandin e. Ew, hevgirtinekê dide temamîya metnî û nasnameyekê dibexşîne wê. Her çend gelek caran "tema" û "mijar" bêne têkelkirin jî ew herdû ji hev cuda ne (Karataş, 2001: 419; Aktaş 1998: 91; Çıkla, 2012: 71-86). Heke em di çarçova destana Kela Dimdim da li ser vê meselê rawestin, mijara destanê rûdaneke dîrokî yanî şerê di navbera kurd û 'eceman ê di tarîxeke dîyar da qewimî ye. Ev mijar bi serê xwe tameke edebî an jî hizreke xwerû nade mirovî. Terzê vegêran û îfadekirina "mijar"ê bi "tema" û "şêwaz"ê ve girêdayî ye. Ev herdû hêman dikarin mijarê zindî bikin, resenîyê bibexşînînê û di dil û mejîyê guhdar û xwîneran da tameke edebî bihêlin. Temaya destana Kela Dimdim a sereke hemaseta kurdînîyê û mêrxasî ye. Hokar û palderê serekî yê ku bûye sebebê vehandin an jî afirandina vê destanê temaya destanê bi xwe ye. Her di destpêka destanê da mijar û tema ji bo xwendevan û guhdarê hûrbîn hatîye dîyarkirin:

Xulimîne xulimîne
Gelî xelk û alemîne
Guh biden dil û yeqîne
Qiseta Xanê Lepzerîn e [Kaplan, 2019: 57]

Di vê benda destpêkê da “mijar”a destanê hatîye dîyarkirin ku dê behsa serhatîya Xanê Lepzêrîn bête kirin. Lê belê hema di bendên li dû vê bendê da îşaret bi “tema”ya destanê hatîye kirin:

Qiseta Xanê zerîndest e
Kemera xîretê beste
Xelkê xweşmêr dane deste

Xelkê xweşmêr dane vê ra
Wê d’bestin kemerên zêra
Navûdeng dinyayê gêra [Kaplan, 2019: 57]

Di van herdû bendan da behsa temaya destanê an jî hîsîyat û hesta palderê vehandina destanê hatîye kirin ku ji serî heta binî li dor xîreta kurdînî û hemasetê dizivire û ev tema li seranserî destanê hatîye nimandin. Wekî ji van bendan dîyar Xanê Lepzêrîn kemera xîretê girêdaye, kesên xîretkêş û mêrçak jî li derdora wî kom bûne û wan bi serborîya xwe ve navûdengê xwe li dinyayê gêrane. Bi bendên dawîyê yên destanê ve jî encama wan a trajik hatîye dîyarkirin ku Kela Dimdim ji alîyê hêzên Sefewî ve hatîye girtin û hemî kurd hatine kuştin:

Hey Dimdimo ker be, ker be
Bi toz û xebarê werbe
Piştî Xanan bo kes nebe

Hey Dimdimo kavl û wêran
Meskenê piling û şêran
Rovî lê d’ken geşt û gêran
Rehmet day û babêd guhdêran [Kaplan, 2019: 154]

Vegêrana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn destaneke millî ya kurdî ye û behsa qehremanî û mêrxasîya kurdan dike. Tê da behsa serpêhatîya Kurdên Biradostî tête kirin ku li hemberî Dewleta Sefewîyan parastina serxwebûna mîrnişîna xwe û berevanîya axa xwe dikirin. Lewra di destanê da temaya sereke hemaset û xîreta kurdînîyê ye û bi hest û hîsên netewî ve hatîye xemilandin. Di seranserê metnê destanê da vegêran, karakter, metafor û teswîr bi temaya sereke, hemaseta kurdînîyê ve girêdayî ne. Her çend di destanê da temaya sereke hemaseta kurdînîyê be jî ji bilî vê hinek temayên din ên harîkar jî hene. Temayên harîkar ku dê li jêrî bi berfirehî bê behskirin em dikarin wiha rêz bikin: Wefadarî û xîyanet, bawerî û dîn, jin û namus û ray û tedbîr (Kaplan, 2019: 41-54). Ev temayên harîkar hemî şiklekî bi temaya sereke ve bestî ne û temaya sereke xurt dikin. Lewra taybetîyên millî û dînî (mezhebî) yên ku gelê kurd ji miletên dî cuda dike di destanê da hatine pêşêxistin. Kurdan di bin rêberîya Xanê Lepzêrîn da, ji bo parastina azadî û kerameta xwe, xwe ji bo şerekî domdirêj amade kirine. Ji bo vê çendê jî keleyeke gelek asê ava kirine û her pêwîsîyeke ji bo herbeke dijwar ên wekî çek û teqemenî, qût û xwarin, leşker û şervan berhev kirine. Di wextê amadekarîyên şerî da bi qasî ji wan hatîye tiştek bi neyarên xwe

nehesandine. Di dema şer û lêkdanan da her reng wêrekî, fîdakarî û mêrxasî nîşan dane. Jinên kurd ji bo kû bi zindî nekevin di destê neyaran da xwe întîhar kirine (Kaplan, 2019: 41).

Ev destan ji ber temaya xwe ya kurdînî û hemasetê û şêwaza vegêranê ya rewanbêj tesîreke zêde li ser kurdan hiştîye û xwe berdaye di nava dil û hinavên xelkî da. Lewra ev rûdana dîrokî ji alîyê dengbêjên kurd ve wekî destaneke netewî ya menzûm hatîye vehandin. Vegêrana xweragirîya Xanê Lepzêrîn û Kela Dimdim bi teswîrên zîndewer, bi dîleweriyeke herikbar û sin'etên edebî ve hatîye tewizandin. Wextê kesek guhdarîya destanê dike, wisa pê hest dike ku di nava sahneyên şerî da ye. Teswîr û vegêran ew qas xurt û zindî ne ku guhdar çêjneke pir xweş ji guhdarîkirinê seh dikin. Destan çi qas ber bi dûmahîyê ve biçe sahneyên dilşewat û rondikrêj zîyade dibin. Ev çende digehe radeyeke wisa ku guhdêrê destanê şehîna hespan, girgira topan, sîrsîra şûran, xîsxîsa xenceran û gazegaza mêrçakan hay jê dibe:

Topêd mezin giregir e
Bircêd belek xirexir e
Rewda şêran nirenir e
Rondkêd sitîyan guregur e
Fermana ser bab û kur e
Xan mîr e, Ebdal Beg kur e[3] [Kaplan, 2019: 100]

Ordîyan bûye girrêne
Misrîyan bûye sîrêne
Wan lawan keft qirîpêne
Wan hespan bûye hîrêne
Her sed ji wan bi yekê ne [Kaplan, 2019: 141]

## Hemaseta kurdînîyê û welatparêzî

Hemaset peyveke 'erebî ye û tête me'na wêrekî, mêrxasî û egîdîyê. Ev têgeh xemxorîya parastina şeref û heysîyeta şexsî, netewî, dînî û welatî û herwisa ragirî û xwedîlêderketina nirx û rûmetên giranbiha îfade dike. Hemaseta kurdînîyê parastina nirx û rûmeta her tiştê bi kurdan ve girêdayî, bergirîkirina her êrîşeke li dijî van rûmetan û di vê oxirê da li hemberî her zorî û zehmetîyekê xweragirî ye. Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn li ser temaya hemaseta kurdînîyê û welatparêzîyê hatîye avakirin. Emîrxanê Biradostî di destanê da wekî "Xanê Kurdan, Mîrê Kurmancîyê û Kurdistanê" tê nasandin. Di serê destanê da wisa tê vegotin ku ew wê bibe Mîrê Kurmancîyê. Hemî bizav û tevgerên Xanê Lepzêrîn li dor vê çendê digerin. Ji bo cîbecîbûna vê armancê gencîneya (defîne) hatîye dîtin tê serfkirin. Hê di wextê avakirina Kela Dimdimî da armanca vê avakirinê wiha tê eşkerakirin:

Pênsed mirc in, pênsed tevir
Toz ber esmanan bû 'evir
Dê têkel bin kurd û gewir

3 Navê kurê Xanê Lepzêrîn ê mezin jî Ebdal Beg e. Vê derê mebest jê kurê wî ye.

Pênsed mirc in, pênsed lihaz
Ser Dimdimî bû gazegaz
Dê têkel bin kurd û beraz

Pênsed mirc in, pênsed mahol
Ser Dimdimî bû golegol
Dê têkel bin kurd û moxol

Pênsed mirc in, pênsed bêrik
Ser Dimdimî bû nirkenirk
Dê têkel bin kurmanc û tirk

Pênsed mirc in, pênsed kuling
Ser Dimdimî bû ringering
Dê têkel bin şêr û piling [Kaplan, 2019: 74]

Ji naveroka bendan xuya dibe ku kurd dê li hember kesên ku wekî gewir (gawir), moxol û tirk tên pênasekirin, şerekî pir mezin bikin. Di destanê da wisa tête dîyarkirin ku hê di destpêkê da Xanê Lepzêrîn amadekarîya herbeke mezin dike. Di rastîyê da Dewleta Sefewî her çend wekî dewleteke Îranî bê nasîn jî ew di binyatê xwe da dewleteke tirk bû (Gündüz, 2008: 456). Ew hêzên leşkerî yên Kela Dimdim muhasere kirî hemî ji hoz û ‘eşîretên tirk ên Şi‘î û Qizilbaş pêk dihatin (Açar, 2019: 43-45). Ji ber vê çendê kurd baş dizanin kanê dijminên li hemberê wan kî ne û aîdîyeta wan a etnîkî hatîye raçavkirin. Di destanê da wisa xuya dibe ku kurd bi danana Kela Dimdimî ve kêfxweş bûne û alîgirên Sefewîyan pê qehirîne. Ev çende di destanê da wiha tê vegotin:

Gava Dimdim xilas bûye
Xwelî serê Şahê Ûrmîyê
Heft salan serê xwe girêdet poşya nîharîyê
Xanek rabû j’Kirmancîyê [Kaplan, 2019: 78]

Wekî ji naveroka vê bendê eşkera dibe ji bo berevanî û êrîşan ji alîyê kurdan ve avakirina bingeheke asê tirs û xof xistîye dilê Sefewîyan. Ji ber vê yekê wezîrê şahî Xelîfe, diçe cem Şahê Îranê, tehlûkeya kurdên Biradostî û Xanê Lepzêrîn ji bo rayedarên dewletê dibêje. Xelîfe di axaftina xwe ya di gel Şahî da gilîyan ji wî dike û dibêje ku li Kurdistanê ev çi Xan e te rakirî. Doza wî textê (doşeka) te ye. Neyarê dînê me ye. Ji vana tê têgehiştin ku hêz û serxwebûna Xanê Lepzêrîn ji alîyê Sefewîyan ve wekî metirsîyeke mezin têtе dîtin (Açar, 2019: 35-38; Kaplan, 2019: 23-24). Wisa têtе teswîrkirin ku Xanê Lepzêrîn de’wa textê Şahî dike û neyarîya ayîna (mezhebê) Sefewîyan dike. Di vê derê da aîdîyeta millî û ayînî wekî du dîyardeyên sereke derdikevin meydanê. Kurdan ji ber van herdû dîyardeyan de’wa azadîyê kirine û nexwestine serê xwe ji bo wan biçemînin (Kaplan, 2019: 83-89).

Xelîfe, dema ji bo cara yekê li ser emrê Şahî, Kela Dimdimî muhasere dike, Xanê Kurdan weke Xanê re’yetê pênase dike û ji wî dixwaze ku otorîteya dewletê qebûl bike. Herwesa dema Şah bi xwe bi ordîya xwe ya mezin ve têtе li ser Kela Dimdim jî Xanê Lepzêrîn wekî Kurmanc dide nasîn û jê dixwaze ku heke otorîteya wî qebûl neke ew dê Xanê Lepzêrîn li ber topên xwe bike nîşan û hedef. Ev çende di bendan da wiha têtе vegêran:

Herê Xanê re'yetê
Qebûl ke tancê[4] dewletê
Heke dê li te rakeyn qiyametê [Kaplan, 2019: 89]

Erê Xano tu Kurmanc î
Tu qebûl bike vî tancî
Heke ber topêd me armanc î [Kaplan, 2019: 133]

Wisa dîyar e têgehên "re'yet" û "kurmanc" ji bo biçûkkirin û kêmkirina kurdan ji alîyê Sefewîyan ve bi qestî têne bikarînan. Têgeha re'yetê ji bo kesên bêdesthilatdar û jêrdest tête bikarînan. Têgeha "tancî" jî bi zimanekî sembolîk ji bo otorîteya Dewleta Sefewî û şehînşahîyê hatîye bikarînan. Dewleta Sefewî dixwaze ku desthilatdarîya Xanê Lepzêrîn ji meydanê rake û wan bikin bindest û fermanberên xwe. Herwesa ji kurdan dixwazin ku an daxwaza wan bi cih bînin an jî dê fermana wan bête rakirin. Cevaba Xanê Lepzêrîn a beramberî vê daxwazê xîret û hemaseta wî ya kurdînîyê û dilêrî û mêrxasîya wî derdixîne meydanê:

Ez wî tancî qebûl nakem
Xwe j'Xudê û Resûl nakem
Kurmanciyê bê nav nakem [Kaplan, 2019: 133]

Xanê Lepzêrîn teslîmbûn û qebûlkirina otorîteya Dewleta Sefewî wekî bênavkirin û hetikandina şeref û heysîyeta kurmancîyê (kurdînîyê) dibîne û lewma bi tundî evî tancî red dike. Xan, ji bo redkirina teklîf û tehdîdên Sefewîyan îşaretê bi du aîdîyetên kurdan dide. Bi îfadeya "Xwe ji Xudê û Resûl nakim" balê dikêşe li ser cudahîya mezhebî û bi îfadeya "Kurmancîyê bênav nakim" ve jî îşaretê dide aîdîyeta etnîkî. Mirov têdigehe ku di destanê da pênaseya kurdînîyê li ser van herdû aîdîyetan hatîye avakirin.

Wextê Şahê Îranê qûwetên xwe yên leşkerî berhev dike gazî hemî xanên Îranê dike. Di destanê da navên xanên hatine vexwendin tête gotin. Wextê xanên vexwendî tên her yekî wan di alîyê xwe da neyarîya xwe ya li dijî Xanê Lepzêrîn û kurdan derdibire. Beramberî vê çendê Xanê Lepzêrîn jî mîrên kurdan vedixwîne û penaha xwe digehîne mîrên kurdan ên wekî mîrê Hekarê, Bahdînan, Serhedê, Botan û hinekên din. Herwisa arîkarîyê ji Osmanîyan (Paşayê Romê) jî dixwaze. Lê belê ji kesên arîkarî jê hatîye xwestin deng dernakeve. Em ji vê bizava Xanê Lepzêrîn têdigehin ku ew yekitî û tifaqa milletê xwe dixwaze û ji bo çêbûna vê tifaqê jî nameyan ji bo wan rêdike. Ji bo destnîşankirina herdû alîyên di destanê da ev rûdane gelek balkêş e. Wexta ku nehatina arîkarîya mîrên kurd xuya dibe, Xanê Lepzêrîn gelek 'aciz dibe û wiha dibêje: "Çima nahên şerê Kurdistanê" [Kaplan, 2019: 113) .

Wextê muhasereya Kela Dimdim giran bûyî û çi harîkarî ji bo wî nehatî, ew tenezulî xwe teslîmkirin û serşûrîyê nake. Di vê navberê da dayika wî ji wî ra wiha dibêje:

Herê Xano berxê dayê
Dest bide şîrî here xezayê
Bike tarîx li dinyayê [Kaplan, 2019: 119]

Xanê Lepzêrîn ji ber gotinên dayika xwe biryar dide ku heta dawîyê ber xwe bide û ew, vê berxwedanê wekî xezayê (şerê pîroz) bi nav dike. Ji vê dîyalogê dîyar dibe ku Xanê Lepzêrîn xwe ji lekedarkirina navê

[4] Tanc: Tacê şahînîyê yê li ser serê Şahê Îranê.

kurd û kurdînîyê dide paş. Ew dixwaze ku bizav û têkoşîna wî di tarîxê da ji bo kurdan bibe sebebê veînana nav û namûseke mezin. Wekî dîyar eve helwesteke netewî ye. Lehengên di destanan da xwedî temsîleke giştî ne û hemî civak dikare xwe di wan da bibîne. Bi xwe sebebekê sereke yê zêde karîgerbûna destana Kela Dimdim a li ser civaka kurdî ji ber vê taybetîya wê têt. Çunkî guhdarên vê destanê wekî şexs xwe di hest û boçûnên lehengî yanî Xanê Lepzêrîn da dîtine û Xanê Lepzêrîn li ber dilê guhdaran bûye protîpa rêberekî qehreman.

**Wefadarî û xîyanet**

Hemî destanên qehremanî û mêrxasîyê di nava xwe da du alîyan vedihewînin. Ji wan du alîyan yek qencîyê û yek jî xerabîyê temsîl dike. Lehengên qencîyê berevanîya heqîyê dikin. Li hemberî wan, kesên zalim û sîtemkar hene û ew jî xerabî û zordarîyê dikin. Ev herdû tîpolojî bi berdewamî di gel hevdû şer û milmilanê dikin. Ev destana mijara gotara me da jî herdû alî hene û destan ji serî heta binî behsa lêkdan û hevrikîya di navbera wan da dike. Di destanê da di serkêşîya Xanê Lepzêrîn da kurd başî û qencîyê temsîl dikin. Berxwedêrên Kela Dimdim hem di gel hevdû hem jî di gel rêberê xwe Xanê Lepzêrîn pir wefadar û dilsoz in. Herwisa Xanê Lepzêrîn jî li hemberî hevalên xwe pir wefadar e û malbata wî û hevalên wî jî ji bo Xanê Lepzêrîn gelek dilsoz û wefadar in. Wextê hêzên Sefewî muhaseraya Kela Dimdim giran dikin, kurê Xanê Lepzêrîn Ebdal Beg ji babê xwe ra dibêje: “Ma tu mêr î, xelk her jin in. Pênsed xîvet xema min in” (Kaplan, 2019: 102). Ebdal Beg, wefadarî û dilsozîya xwe ji bo bavê xwe eşkera dike û di xîretkêşîya kurdînîyê da cihê xwe li cem babê xwe digire. Herwisa wextê Xanê Kurdan ji mêrçakên xwe Qeroyê Bêdkarî dike qasid û rêdike cem Şahî, Şah ji Qero dixwaze ku serekanîya ava kelê nîşanî wî bide. Lê belê Qero vê red dike û wiha dibêje:

> Hun çi nihe min d’kujin
>
> An min d’kujin danê evarî
>
> Min ker ker b’ken ber xîzarî
>
> Min bavêjne ber mişarî
>
> Nabim qatilê çend hizarî [Kaplan, 2019: 105]

Ji gotinên Qero eşkera dibe ku ew di gel Xanê Lepzêrîn û milletê xwe pir wefadar e. Ew ji vê teklîfê pir ‘aciz dibe û li ser bi çi şiklî bêbextî û xîyanetnekirina li milletê xwe bi biryar e. Li hemberî vê helwesta Qeroyê Bêdkarî ya wefadarîyê di destanê da sembola xîyanetê yekî bi navê Mehmûdkê Alekanî ye. Mehmûd bi ‘eslê xwe yek ji hostayên avakirina kelê ye û herwisa şarezayê serekanîya nihênî û veşartî ya Kela Dimdim e. Bi rastî kronîkên Îranî yên bi berfirehî behsa rûdana Kela Dimdim dikin behsa çi xîyanetên navxweyî yên li hemberî Xanê Lepzêrîn nakin. Em nizanin di rastîyê da kesekî bi navê Mehmûd ê ku xîyanet li Xanî kirî hebû an nebû. Heke kesekî bi vî rengî di rastîyê da nebe jî mumkîn e ku di destanê da ev protîp hatibe afirandin. Li dû vegêrana destanê dema şerê kurdan û ‘eceman dijwar bûyî, Mehmûd şevekê ji kelê derdikeve, diçe cem Şahî û serekanîya ava Kela Dimdim nîşanî wan dide. Li ser vê çendê ‘ecem berê ava kele pîs dikin û paşê jî avê li ser kelê digirin. Êdî piştî vê çendê bizava kurdan a bergirîyê sist dibe û di dawîya dawî da ji ber xîyaneta wî Kela Dimdim dikeve destê Sefewîyan. Di destanê da cezayê Mehmûdî bi destê neyar û dijminên kurdan ve tête danê. Mehmûdê hemberî vê xizmeta xwe ji dijminan pir hêvî, ji Şahî dixwaze ku bûka Xanî Xanperî ji bo wî bête danê. Şah ji daxwaza wî gelek ‘aciz dibe û ji wî ra dibêje: “Ew weca [feydê] te ji Xanê Kurdan girtî dê ji min jî bigirî” (Kaplan, 2019: 107). Şah dixwaze bibêje ku heke tu kêrî Xanê xwe nehatibî tu kêrî min jî nahêy. Mehmûdkê Alekanî diheşînin devê topê da, berê wî didin birc û şûrên kelê û pê ve dipeqînin. Hevalên Xanê Lepzêrîn beramberî vê bêbextîyê, ‘ecêbgirtî dimînin û wiha dibêjin: “Xano, me rû nema li cîhanê. Çawan xulam, baxwoyê xwe ji ber xwe bidet kuştinê” (Kaplan, 2019: 106). Di destanê da bi awayekî vekirî tête dîyarkirin

ku encama kesê xîyanetê li heval û milletê xwe dike, bêrûmetî û bêşerefî ye. Heke mirov kêrî milletê xwe nehêt kêrî xelkê bîyanî jî nahêt.

Dilsozî û wefadarîya Xanê Lepzêrîn a ji bo heval û milletê xwe di seranserî destanê da hatîye belavkirin û nimandin. Şervanên kurd dema ji bo şerê man û nemanê yê dawîyê ji kelê xurûc dikin, Xanê Kurdan emrê helandina hemî zêr û zînetên li kelê dike û dixwaze ku ew hemî ji bo çêkirina çek û şûrên şerî bêne bikarînan. Vê çendê wekî "kerimandina lawikan" (Kaplan, 2019: 121) pênase dike. Feqî û melayên di Kela Dimdimî da hazir, xwe ji şerê dawîyê ra amade dikin, wefadarîya xwe ji bo Xanê Kurdan û xelkê Kela Dimdim raçav dikin û dibêjin: "Ser gorî Xanê Kurdan e. Nê evro roja mêran e" (Kaplan, 2019: 123).

Destana Kela Dimdim da mînaka wefadarîyê ya ji hemîyan mezintir wefadarîya jinên (sitîyên) Kela Dimdim e. Dema xuya dibe ku êdî çi rêyên kurdan ên xelasîyê nemane û ew sernakevin, jin bi çi awayî teslîmbûna bi Sefewîyan qebûl nakin. Li şûna teslîmbûna dijminî ew biryara xwekuştin û întîharê didin. Di destana Kela Dimdim da sahneyên herî dilşewat û xemgîn di teswîrkirina helwest û rewşa jinên kelê da dîyar dibin. Dema ku êdî ji serfkeftinê bêhêvî dibin Xanê Lepzêrîn destûrê dide jinan ku dikarin biçin teslîmî dijminî bibin. Lê belê jin bi tundî evê çendê red dikin û dibêjin me mirin ji teslîmbûnê pê xweştir e. Qismekî jinan jahrê vedixûn û qismek jî dergûşên xwe bi himbêza xwe dipêçin û xwe ji dîwar û bircên kelê da diavêjine xwarê. Wefadarîya jinan di destanê da wiha tête teswîrkirin.

Xan dibêjît van zeryane
Xemilin renge horyane
Min, hun hemî destur dane
Hun herin bo kafirane

Kepê sitîyan birî bît
Serkokê wan tiraşî bît
Paş xanan maldarî nabît

Wan landik xwe ve şidandin
Xwe hewalan da firandin
Cergê van xanan kirandin [Kaplan, 2019: 124, 126]

Di destanê wefadarî û dilsozîya Xanê Lepzêrîn û Xanê Mukrî ya hemberî hev pir serincrakêş e. Ev herdû leheng destebirayên hevdû yên axretê ne. Ji hev ra qewl û soz dane ku piştî êkudu dinyadarîyê nekin. Wextê sitîyên Kela Dimdim întîhar dikin, Xanê Mukrî xanima xwe û lawê xwe yê biçûk li hespekî siwar dike, diîne binê eywana Kela Dimdim. Wextê çavê Xanê Lepzêrîn bi wan dikeve, ji Xanê Mukrî ra dibêje ku wisa xuya ye gava şer biqewime tu dê birevî. Xanê Mukrî li ser vê xeberdanê ‘aciz dibe, şûrê xwe dikêşîne, xanima xwe û lawê xwe dikuje. Ev çende di destanê da wiha tête vegotin:

Xanê Mukrî têt, lezînît
Jinê w kurî d'gel xwe tînît
Nava Dimdimey da tînît

Xanê Kurdan wê dibête
"Heke şerm, heke kirêt e

Heçî mal û jin divête
Bila ji Dimdimî nehête
Da ji Xudê nebîn fihête

Heçî divêt mal û jine
Bila nehêt di gel mine
Bo min jî Xudê mezin e"

Xanê Kurdan gote Xanê Mukrî:
"Tu ew nînî yê li devî
Heçî gava şer helkevî
Yeqîn eve tu dê revî"

Mukrî got: "Te ji ber min e
Min heram bin mal û jine
Xwe d'gel te bidem kuştine"

Xanê Mukrî d'zivirîte
Jinê d'gel kurî d' kujîte
Gurî ji hinavan rad'bîte

Mukrî, şîrê xwe li ba kir
Ruh ji qalibî cuda kir
Cerg û dilan agir rakir [Kaplan, 2019: 126-127]

Di destanê da gelek numûneyên wefadarîya Xanê Lepzêrîn a ji bo leşkerê xwe û herwisa dilsozîya leşkerî a ji bo Xanê Lepzêrîn hene. Dema leşkerê Xanê Lepzêrîn ji bo şerê dawîyê ji Kela Dimdimî xurûcê dikin, Xan li leşkerê xwe dike gazî ku her kesekê nexwaze beşdarîya şer û lêkdanê bike bila di kelê da bimîne. Leşkerê Xanê Lepzêrîn bi tundî evê çendê red dikin û dibêjin: "Xano! Ma em golikên babê te bûn? Eve heft sal e em benda vê rojê ne. Çawan tu vê teklîfê li me dikî?" (Kaplan, 2019: 127). Bi vî şiklî wefadarîya xwe ji bo Xanê Lepzêrîn dîyar dikin. Numûneyek din a wefadarîya Xanê Lepzêrîn a ji bo leşkerê xwe eve ye ku di hengameya şerî da derdikeve meydanê. Xanê Lepzêrîn dema dibîne ku şivanek di şerî da pir bi mêranî şer dike, ji wî ra wiha dibêje:

Hey şivane hey şivane
Ez bim qurbana destane
Nizanim carek dî ez nebim xane
Dê te Ûrmîyê keme sultane
Deme te dewr û meʻaşane [Kaplan, 2019: 146].

Xanê Lepzêrîn bi vî şiklî şivanê mêrçak teltîf dike. Mînakekek din a balkêş a wefadarîyê, dilsozîya dayika Xanê Lepzêrîn Le'lîxanê ye. Wextê Xanê Lepzêrîn tê kuştin û kele dikeve di destê neyaran da dibêje: "Hey Dimdimo! Bila xwelî li serê te be. Piştî Xanan bo kesê nebe". Paşê poleke agirî diavêje li nava barûd

û têza cebilxana kelê û Kela Dimdimî hildiweşîne. Naxwaze piştî Xanê Lepzêrîn Kela Dimdim bikeve destê Sefewîyan (Kaplan, 2019: 153). Ev çende di bendan da wiha tête gotin:

Hey Dimdimo berê zer bî
Heft salan hîsar li ser bî
Piştî Xanan xwelyê werbî

Hey Dimdimo ker be ker be
Bi toz û xebarê werbe
Piştî Xanan bo kes nebe [Kaplan, 2019: 154].

**Dîn û bawerî**

Di destana Kela Dimdim da du dîyardeyên sereke yên bi aîdîyeta kurdan ve girêdayî hene: Kurdînî û dîn (mezheb). Serdestîya van herdû hêmanan li seranserî destanê da têtе dîtin. Di destanê da şerê kurdan ê di gel Dewleta Sefewî wekî "Xeza" yanî şerê dînî tê teswîrkirin. Di piranîya bendên destanê da ji bo Sefewîyan sifetên "gewir, kafir, kuffar" têne gotin. Di rastîyê da Dewleta Sefewî dewletek Musliman bû û tenê ji alîyê mezhebî ve cuda bû ku ew jî Şi'îyatî bû. Lê belê ev cudabûna mezhebî wisa kirîye ku kurd wan wekî ne Muslimanan bibînin. Cudahîya mezhebî wekî sebebeke xurt a lihevnekirina kurd û Sefewîyan hatîye destnîşankirin. Ev cudahî hinek caran ew qas xurt dibe ku di destanê da ew wekî "dijminê dînê Pêximberî (s.x.l.)" tên nîşandan. Wextê Xanê Mukrî dihere li bin çadira Xelîfe, ji wî dixwaze ku şehda muslimanbûnê bîne (Kaplan, 2019: 140). Wisa dîyar e ku Xelîfe wek Muslimanekî nahêt dîtinê. Herwisa dema Xelîfe jî li cem Şahî nekamîya Xanê Lepzêrîn dike, Xanê Lepzêrîn wekî neyarê dînê Şahî tohmetbar dike. Wextê ji Xanê Lepzêrîn tê xwestin ku tancê şehînşahîyê qebûl bike, ew vê çendê wekî dijî Xudê û Pêximberî (s.x.l.) bûnê dibîne û wiha dibêje:

Wey kafiro bê usûl e
Xweş nahêt Xudê w Resûle
Tancê te nakem qebûle [Kaplan, 2019: 87].

Wekî ji vê gotinê têtе famkirin Xanê Lepzêrîn ji ber sebebên dînî ve hukim û desthilatdarîya Sefewîyan qebûl nake. Wextê Xanê Lepzêrîn û leşkerê xwe ji Kela Dimdimî xurûcê dikin wisa têne taswîrkirin ku ew selawatan didin ruhê Hz. Muhemmed (s.x.l) û Xanî cewşenek zêrîn li xwe kirîye (Kaplan, 2019: 133).

Xanê Lepzêrîn di destanê da wekî mirovekî dîndar û ewlîyayekî tê teswîrkirin. Wextê destê wî tê birîn, Şah ji bo wî destekî zêrîn çêdike. Xanê Kurdan du'ayê dike û ruh dikeve destê wî yê zêrîn. Destê wî ji berê çêtir dibe. Di teswîrên geşt û geryana Xanê Lepzêrîn û Şahê 'Ecem, gava ew diçin nik şivanekî bêhna xwe vedidin, Şah radikeve û di xewna xwe da gencînê (xezînê) dibîne. Lê belê Xanê Lepzêrîn xewna Şahî bi hişyarî dibîne. Wisa têtе teswîrkirin ku hêzeke îlahî ji bo Xanê Lepzêrîn rêberîyê dike û cihê gencînê nîşanî wî dide. Dema Xanê Lepzêrîn evê gencîneya ji zêr û zînetan tijî dibîne, nizane kanê wê gencînê dê ji bo çi mezêxe. Dîsa ji alîyê hêza îlahî ve armanca dayîna vê gencînê ji bo Xanê Lepzêrîn têtе gotin. Şêx Ebdulqadirê Geylanî têtе xewna Xanê Lepzêrîn û meqseda dayîna gencîneyê ji bo wî wiha îfade dike.

Hate xewnê Xewsê Bexdayê
Tancê 'ecem kêr te nayê
Rabe, dê lê vekeyn xezayê [Kaplan, 2019: 68].

Tête dîyarkirin ku qebûlkirina desthilatdarîya ‘eceman (tancê ‘eceman) kêrî wî nayê û divê ew ji bo xezaya dijî wan vê gencînê bi kar bîne. Tiştê balkêş ew e ku di destanê da kesê ji bo qasidîya hêza îlahî hatîye hilbijartin Şêx ‘Ebdulqadirê Geylanî ye ku ew di nava kurdan da wekî şêxek û rêbereke dînî yê netewî tête dîtin. Navê wî di nava edebîyata devkî û folklora kurdî da gelek belav e. Gava Xanê Kurdan ji xewê hişyar dibe xewna xwe wekî îşareteke îlahî hisab dike û qerara şerê dijî ‘eceman dide.

Di vegêranê da kurdên di Kela Dimdim da wekî mirovên dîndar û bawermend têne teswîrkirin. Di kelê da mela û feqî hene û ew bi şolên dînî yên xelkê bi rê ve diben. Wextê Xanê Kurdan dibêje ku hemî şolên me bi kitêb in, wisa dîyar e mebest ji vê gotinê ew e ku di karûbar û rêvebirinê da li dû emr û nehyên Îslamê tê hereketkirin. Ji destanê tête têgehiştin ku Xanê Lepzêrîn pratîkên dînî bi cih tîna. Di destanê da wisa tête vegêran ku dema ew ji bo wergirtina destnimêja nimêja sibê çûye li ser sirîçxaneya kelê pê hesîyaye ku ‘eceman ava kelê pîs kirine. Herwisa dema ava kelê hatîye birîn, xelkê kelê ji têhnan da perîşan bûyî û nexweşîyan rûdayî, ew pir dikevin tengîyê û dest bi du‘akirinê dikin. Di du‘ayên ji bo barîna baranê da, Xanê Lepzêrîn wekî ewlîyayekî tête teswîrkirin. Her çiqas werzê baranan nebe jî ku li dû vegêrana destanê di navbera mehên Tîrmeh û Tebaxê da ev rûdane çêbûye, da‘ayên Xanê Lepzêrîn ji teref Xudê ve hatîne qebûlkirin û baran ji evran barîye (Kaplan, 2019: 108-111).

Di destanê da li ser destê Xanê Kurdan ê şubhetî ewlîyayekî û şexseke pîroz tê teswîrkirin da pir keramet zahir dibin. Wextê ew hez dike nameyan ji bo mîrên kurdan bihinêre, nameyan diavêje li ber bayê rehmê û bayê rehmê van nameyan digehînine mîrên kurdan. Herwisa gava hêza kurdên di kele da pir hindik dibe, Le’lîxan ji kurê xwe ra dibêje ku kes ji bo harîkarîyê nayê, îlla ewlîya (batinî) dikarin bêne harîkarîya te. Li ser vê çendê ew du‘ayê dike û batinî di sûretê kotiran (kevokan) da difirin û didanin li ser birc û dîwarên Kela Dimdimî (Kaplan, 2019: 112-116). Di destanê da tiştê balkêş ewe ku hemî ewlîya û batinîyên têne hewara Xanê Lepzêrîn jî her ew kes in ewên kurd an jî kurd wan ji xwe qebûl dikin. Lewra di destanê da peywendîyeke xurt a di navbera kurdan û hêzên îlahî hatîye danan û ew jî bi şiklekî bi kurdînîyê ve hatine girêdan. Xanê Kurdan bi hatina batinî û ewlîyayan ve pir şa dibe. Batinîyên hatine hewara kurdan hêzeke xurt didin û morala kurdên di muhasarayê da geş dikin. Her çend di şerî da Sefewî van batinîyan bi çavê serê xwe nebinin jî ew hîs dikin ku qûwetên nihênî ji bo arîkarîya kurdan hatine. Lewma batinîyên nihênî serê leşkerê Sefewîyan difirand û wan kes bi çavê xwe nedidît. Ev yeke di destanê da wiha tê îfadekirin.

> Binêrin koma xanane
> Dengê selawatan esmane
> Şerê xazî batinyan e
> Ser d’firin qalib cih mane
>
> Ev ‘ecem ecêbê d’girin
> Çi nabînin, serêd firin
> Batinî dê me birinin [Kaplan, 2019: 152]

## Jin û namûs

Di destana Kela Dimdimî da bi gelemperî jinê û bi taybet Le’lîxana dîya Xanê Kurdan roleke girîng gêraye. Le’lîxan wekî serejineke gelek aqil, dinyadîtî û têgehiştî tête teswîrkirin. Ew ji bo Xanê Lepzêrîn wekî sitargehekê ye ku her wextekî ew dikeve tengîyê û nizane kanê dê çawan hereket bike, penaha xwe dibe Le’lîxana diya xwe, ji wê dişêwire û li dû rêberîya wê hereket dike. Wisa dîyar e Xanê Lepzêrîn ji

dayika xwe fêrî kurdînî û mêrxasîyê bûye (Kaplan, 2019: 48, 69, 79, 109, 114). Wê di cara pêşîyê kurê xwe hîn kirîye ku divê êdî ew xulamîya Şahî bihêle û keleyeke asê û mukim ava bike. Ev çende di bendên destanê da wiha tête îfadekirin.

Heke şerm e heke kirêt e
Me ev xulamîye nevête
Dûmahî dê bîn fihête [Kaplan, 2019: 69]

Di destanê da rola Le'lîxanê tenê li ber Xanê Lepzêrîn danana vê armancê ve xelas nabe. Piştî hîngê jî bi zanîn û dûrbînîya xwe ve rê û rêbaza gehiştina armancê jî ji bo kurê xwe eşkera dike. Ji kurê xwe ra dibêje ku here cem Şahî û bi qasî kevilê (çermê) gayî erdî ji wî bixwaze. Xanê Kurdan li dû rêya dîya wî danîye li ber wî, diçe nik Şahê Îranê û bi qasî kevilê gayî erdî ji wî dixwaze. Şah, çi me'nayê nade daxwaza Xanî û paşê hindî çermê gayî erdî dide wî. Xan, ewî çermê gayî di avê da dinimîne, divêl divêl dike ben, erdê bi qasî gulolka benî dipîve û Kela Dimdimî lê çêdike (Kaplan, 2019: 70-72). Bi vî awayî bi rêberîya dayika xwe bêyî pêhesandina Şahê Îranê Kela Dimdim ava dike û gavek din nêzî pêkînana armanca xwe dibe.

Di destanê di çendîn erdan da têtê dîyarkirin ku her demeke li Xanê Lepzêrîn pêsîrtengî çêdibe, ew diçe û xwe dispêre hembêza dîya xwe. Wextê ava Kela Dimdim tê birîn û kurdên di kelê da bêçare dimînin an jî di dema Xanê Lepzêrîn êdî ji hatina harîkarîya mîrên kurdan bêhêvî bûyî, xwe diavêje hembêza dîya xwe û jê dixwaze ku ray û teybîrekê li halê wî bike. Le'lîxan di her tengavîyekê da rêyeke xelasîyê peyda dike û kurdan ji tengavîyê dertîne. Lê belê dema di berxwedana Kela Dimdimî da dawîya rê dîyar dibe û êdî ji serkeftinê bêhêvî dibin, Le'lîxan li ser hemda xwe dimîne û metaneta xwe muhafeze dike. Di wan kêlîyên gelek nazik da jî rê nade ku kurê wê û leşkerê wî bêhêvî bibin û doza xwe bênav û lekedar bikin. Kurê xwe han dide ku heta dawîyê bi mêr û mêrxasî li hemberî neyaran şerî bike û bi çi terzî hizra revê û teslîmbûnê neke. Di destanê da ev çende taybetî di dîyalogên berî xurûca ji Kela Dimdimê a ji bo şerê man û nemanê da yên di navbera Xanê Lepzêrîn û dayika wî da dîyar dibe. Le'lîxan ji kurê xwe ra wiha dibêje:

Xano, kurê dêleşêrê
Dest b'de şîrî here gêrê
Xudê berxê nêr da bo kêrê

Xanê Kurdan jî li dû van gotinan wiha dibêje:

Nehavêje hişketane
Dê dest avêjim çekane
Tine dê b'çime meydane

Le'lîxan şîretan li kurê xwe dike û ji wî ra wiha dibêje:

Hey Xano kurê Momê
Bes bikêşe evê domê
Dest b'de şîrî here komê
Heke newêrî ez wê çûmê
Da nav biçît Erzerome

Hey Xano serê hîvîyê
Tu nekêşe rezîlîyê
Dest b'de şîrî here zevîyê
Heke newêrî b'de sitîyê
Da nav biçît Kurmancîyê

Hey Xano serê dewletê
Tu nekêşe rezaletê
Dest b'de şîrî here dawetê
Heke newêrî bide metê
Da nav biçît nav hukmetê

Tu Xan î, Xanê Kurdan î
Melevanê bin behran î
Delîletêd şolan d'zanî

Herê Xano berxê dayê
Dest b'de şîrî here xezayê
Bike tarîx li dinyayê [Kaplan, 2019: 118-119]

Wekî ji van bendan tête têgehiştin di destanê da temaya jinê di kesayetîya Le'lîxanê da wisa hatîye honandin ku di rastîyê da barhilgir û rêberê hemaset û xîreta kurdînîyê jin e. Çunkî Le'lîxan tenê hizra wê rojê nake û pêşbînî dike ku berxwedana kurê wê dê cihê xwe di dilê milletekî da çêke û ev qehremanî dê heta hetayê bê vegêran. Lewma muhimîya meselê bi Xanê Lepzêrîn dihesîne û ji wî dixwaze ku bê xof û tirs bila şer û berevanîyê bike. Rêberî û piştevanîya Le'lîxanê motîvasyon û morala Xanê Kurdan bilind dike û navê wî û hevalên wî bi serbilindî li tarîxê dide nivîsandin.

Di destanê da helwesta Le'lîxanê ya berwedêr li jinên dî yên di destanê da jî tête dîtin. Wextê ketina Kela Dimdim xuya dibe Xanê Kurdan jinan tevan dicivîne û ji wan ra dibêje ku hun hemî destûrdayî ne. Ya ku dixwaze dikare teslîm bibe. Lê beramberî vê yekê jinên kelê di serkêşîya jina Xanê Kurdan Sitî Xatûnê da dicivin û qerarê didin ku bi çi şiklî xwe teslîmî hêzên Sefewî nekin û namûsa xwe neşkînin. Xanperîya bûka Xanê Kurdan tê ne, hemî jinên kelê xwe dikujin. Ji ber ku Xanperî ducanî bûye, ew dibêje ku hemlê min, hemlê kuran e. Kurê min ê heyfa babê xwe hilîne. Lewma Xanê Kurdan izna wê dide ku biçe li nav malbaba xwe. Di destanê da ji bo ku nekevin destê dijminî û îffet û namûsa wan lekedar nebe, xwekuştin û întîhara jin û zarokên sava wekî trajedîyeke pir dilsotî tê teswîrkirin.

Sitîyêd zer û zirav e
Li rûyan nekeftî tave
Mixabin, 'ecem bêt nave

Wan, mendal xwe ve şidandin
Xwe hewalan da firandin
Cergê van Xanan kirandin [Kaplan, 2019: 125-126]

Le'lîxan di dawîya destanê da jî roleke berçav digêre. Wextê kurd hemî tên kuştin, dest û dilê wê nagire ku Kela Dimdim ji bo Dewleta Sefewî bimîne. Lewma gava leşkerê Sefewî hemî tên di nava Kela Dimdimî, ew poleke agirî diavêje li nava cebilxanê, cebilxanê diteqîne û kelê diruxîne.

**Ray û tedbîr**

Ray û tedbîr temayeke girîng e ku di destanê da hatîye nimandin. Lehengê destanê Xanê Lepzêrîn armancek daye ber xwe û lewra hemî rûdanên destanê li dor plansazîyekê hatine avakirin. Xanê Lepzêrîn mîrekî kurd e û rêveberîya xelkekî û deverekê dike. Ji bo gehiştina armanca xwe bi ray û tedbîr hereket dike, li mirovên zana û aqilmend dişêwire. Di destanê da armanca doza Xanê Lepzêrîn her di dema avakirina Kela Dimdimî da wiha tête destnîşankirin:

Xan d'bêjît pênsed palane
Ez bim qurbana destane
Qahîm danin van koçkane
Da xwe bigrin ber topane
Dê bim cîhangîrê cîhane
Dê bim dijminê şahane [Kaplan, 2019: 74]

Wekî vê bendê xuya dibe Xanê Lepzêrîn dil heye ku bibe cîhangîrê cîhanê û ji bo bicihhatina vê yekê divê di gel Şahê Îranê şerî bike. Ji bo gehiştina vê daxwazê Xanê Kurdan nexşerêyek amade kirîye û wekî li seranserê destanê da tête teswîrkirin ew bi ray û tedbîr hereket dike. Berî ku biryarekê bide, li ser wê meselê serê xwe diêşîne, hûr û dûr û kûr dihizire, paşî qerarekê distîne. Şolê xwe bi hêvîya şansî ve nahêle, li dû plan û nexşerêyê tevdigere. Di destanê da tê dîtin ku bernameya hatîye danan pêngav pêngav tê teqîbkirin.

Di destanê da wisa têtê teswîrkirin ku gava Xanê Kurdan û Şahê 'Ecem bûne dostên hevdû û wê da, Xanê Lepzêrîn bi serederîya xwe ve karîye ku Şahî bi xwe bide bawerkirin û piştrastkirin. Bi wêrekî û wefadarîya xwe ve xwe li Şahî daye qebûlkirin û bûye dostekî wî yê êmin û pêbawer. Şahî ew çend jê hez kirîye ku destekî zêrîn ji bo wî çêkirîye û ji bo avakirina keleyekê ruxset daye wî. Herwisa Xanê Lepzêrîn bi feraseteke dûrbîn cîyê xezînê ji Şahî veşartîye û şîyaye vê xezînê di destê xwe da bigire. Wextê melayekî çavbirçî hez dike Şahî bi gencîneyê bihesîne û bernameya Xanê Kurdan xerab bike, Xanê Kurdan bi şiklekî aqilane wî berteref dike. Xezîneya dîtî ji bo mesrefa şerekî domdirêj vediqetîne. Diçe cem Şahê Îranê û bi şêweyekî nerm hindî çermê gayî erdî jê dixwaze û bi vî şiklî wî qayîl dike. Xanê Lepzêrîn wisa aqilane hereket dike ku Şahî bi çi awayî bi doz û planên xwe nahesîne (Kaplan, 2019: 59-82, 85-86). Ji ber ray û tedbîrên wî, Xelîfe çend nekamîya wî li cem Şahî bike û bixwaze Şahî derbarê planên Xanî da hişyar bike jî Şah bi gotinên Xelîfe qayîl nabe û Xanî wekî mirovekî pêbawer pênase dike. Ev çende wiha têtê îfadekirin:

Şahî got: "Xelîfeo qet we nîne
Xan, xulamekî emîn e
Min destê wî kir zêrîne
Min divet dil û yeqîne
Çi car li min nabît xaîne [Kaplan, 2019: 85]

Xanê Lepzêrîn di dema avakirina kelê da wekî karker dixebite û wekî serhostayekî li ser karker û hostayên xwe disekine. Plana avakirina Kela Dimdim ew bi xwe didane û ji bo çêkirina keleyek pir

mukim û asê ji çi mesrefê nareve. Şabaş û bertîlan li ser karker û hostayan belav dike û dilê wan xweş dike da ku ew karê xwe ji dil bikin. Kela Dimdim di du merhaleyan da diqedîne. Di merhala pêşîyê da xîm û binyadê kelê didane û ava kelê bi rêka solîneyan ve tîne Kela Dimdim û wan solîneyan nihênî dike. Ji bo ku pale û hosta nihênîyên kelê ji bo kesê nebêjin, ji bilî Mehmûdkê Alekanî, hemîyan dikuje. Paşê derbazî merhala duyê dibe û bi hinek pale û hostayên din ve kela xwe temam dike. Piştî qedandina kelê ji bo ceribandina mukimîya wê, hinek topan tîne û wan topan berdide birc û şûrên kelê. Piştî ku ji qahîmî û mukimîya Kela Dimdimî qayîl dibe êdî derbasî merhaleyên din ên plana xwe dibe. Xanê Lepzêrîn ji bo dabînkirina leşker, çek û erzaqê şerekî domdirêj dest bi xebatê dike. Li nav gund û warên kurdan digere, mirovên mêrçak dicivîne, ‘embarên Kela Dimdim bi qût û erzaqê xwarinê ve tijî dike û hedad û ciqsîyan diîne û çekên şerî dadirijîne. Heta ku van hemî amadekarîyan xelas neke, têkelîyên xwe di gel Dewleta Sefewî têk nabe. Bi vî şiklî dikare xwe ji nekamîyên Xelîfe biparêze û dostînîya xwe û Şahî berdewam bike. Dema şer di navbera herdû alîyan dest pê dike, ji nû Şah bi van berhevkarîyên Xanê Lepzêrîn dihese. Şah gava tête pêş Kela Dimdimî digirnije û wiha dibêje:

> Deşta Hozanê serkeftîye
> Şah pêş kelatê keftîye
> Wê kenî û girnîjîye
>
> Wey le Xanê nanbiryayî
> Xweş amar e te deynayî
> Pîroz bît xudan jê mayî [Kaplan, 2019: 99]

Xanê Kurdan di nava şerî da jî bi ray û tedbîr hereket dike. Hindî ku jê tê motîvasyon û morala şervanên xwe bilind digire. Wextê qûwetên leşkerê Sefewî kele muhasere kirî û çadir û xîvetên xwe li dora wê vedayî, kurê wî Ebdal Beg sahmê digire û ditirse. Xanê Kurdan, Ebdal Begê teselî dike û diledilê wî dide, dibêje ku: “Netirse! Ev ‘eceme gelek hîleker in. Çadir û xîvetan vala digirin da ku em bitirsin” (Kaplan, 2019: 102). Wextê di nava herdû alîyan da dibe şer û lêkdan, Xanê Kurdan ji bo şikandina motîvasyona dijminî fend û fêlan digerîne. Dema xwarina kelê hindik dimîne Xanê Kurdan, mastî ji şîrê dêlekê çêdike û ji bo Şahê ‘Ecem dişîne. Ew dixwaze bi dijminî bide zanîn ku Kela Dimdim bi xwarin û vexwarinê ve pir e û standina wê mumkîn nîne. Ji alîyê dî ve Xanê Kurdan ji bo xurtkirina qûweta bergirîya şervanên xwe her tim di liv û bizavê da ye û morala wan xweş dike. Hêza xwe ya leşkerî bi tertîba nîzamî rêkdiêxe. Berî ku ji kele xurûc bike şervanên xwe dicivîne û bernameya şerî ji bo wan xuya dike. Ji şervanên xwe dixwaze ku herkes li dû vê planê hereket bike.

## Encam

Heke pênaseya destanê wekî cûreyekî edebî li ber çavan bête wergirtin dê bête dîtin ku ev cûreyê vegêranê ji hemî cûreyên din ên edebî pirtir bi nasnameya netewî ve girêdayî ye. Destan xudanê nasnameyeke giştî ye û her ferdekî mensûbê civakê xwe tê da dibîne. Sebebên darijtina destanan hene û bi honandina destanan ve tête xwestin ku hinek mesaj bêne ragehandin. Rûdanên mezin ên di dîroka milletekî da qewimî karîgerîyê li ser bîrdanka civakî dikin û nahêle ku ew rûdan bêne jibîrkirin. Ji ber vê çendê sebebê honandina destanan zindîhiştin û veguhastina hîsîyata di dema qewimîna karesateke mezin a di dîroka milletekî da peydabûyî ye. Armanca destanê nemirkirina vê hîsîyatê ye ku ew di gaveke dîrokî ya nazik û taybet da derkeftîye meydanê û coş û xuroşek an jî keser û axînek di dilê civakê da peyda kirîye. Lewra destanên netewî bi hestên hemaset û xîretê ve şûûr û ruhekê dibexşîne milletekî û

hêza xweragirî û xwebûnê dide civakê. Ji ber vê çendê destan di parastina hebûna milletekî da roleke sereke dileyîzin.

Dema li destana Kela Dimdim bête nêrin tête dîtin ku sebebê honandina vê destanê zindîhiştina ruhê bergirî û parastina şeref û heysîyeta kurdînîyê û nehetikandina nav û namûsa kurdan e. Di destanê da bikarînana temayên hemaset û xîreta kurdînîyê, wefadarî û xîyanet, ayîn û bawerî, jin û namus û ray û tedbîrê ve tête xwestin ku nirx û rûmetên milletekî bêne zindî hiştin û dest bo destî bêne veguhastin. Armanca destanê di şexsê lehengên destanê da avakirina protîpên serkêş û rênîşander ên netewî ne. Lewra civak her dema ku bikeve di tengavîyê da dikare wan lehengan wekî numûne wergire û helwest û xweragirîya wan nîşan bide. Destana Kela Dimdim bi temayên xwe ve îdealekê datîne li ber milletê kurd. Tête xwestin ku nirx û rûmetên kurdan dike milletek û wan ji milletên din cuda dike bêne dîyarkirin û ji bo parastina wan, her cûre bizav bête kirin. Nirx û rûmeta ku parastina wan tête xwestin wekî di destanê da dîyar dibe aîdîyeta etnîk û dînî ya kurdan e. Ev herdû dîyarde di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da wekî "dîn" û "dewlet" derdikevin meydanê. Li dû pêhesandina destanê kurd ji bindestî û destdirêjîya li ser xak û rêveberîya xwe hez nakin û ruhê wan ê netewî tenê bi azadî û serbixwebûnê ve dikare aram bibe.

Lehengên destana Kela Dimdim û helwestên wan di avakirina qehreman û nirxên netewî yên bîrdanka civakê da roleke muhîm digêrin. Bi şiklekî tête îfadekirin ku her dema ku ev zurûfên nazik bêne pêşîya civakê divê kurd lehengên destanê wekî rol-model wergirin û heman helwestên wan dîyar bikin. Li dû temayên vegêrana destanê kurdînîya îdeal wiha tête destnîşankirin ku kurd ji azadîyê hez dikin û ji bindestîyê nefret dikin. Ew ji tedaxula destên bîyanî yên di nav karûbar û biryarên wan da qebûl nakin. Ji bo destnedana van nirx û rûmetan xîretkêş in û ji serê xwe diborin lê belê hetikandin û binpêkirina van rûmetan naborin. Herwisa divê kurd her dema ku tûşî êrîşên nehêlanê bibin divê li hemberî hev wefadar û dilsoz bin, xîyanet û bêbextîyê li milletê xwe nekin. Di bizav û berxwedana man û nemanê da her kesek xwe bide li ber barî û bi fedakarane xebatê bike. Her dozeke netewî ya tête kirin divê li dû plan û nexşerêyekê bête rêvebirin û xemsarî tê da nehête kirin. Di temayên destanê da cesaret, mêrxasî, dîndarî, xîret û parastina namûs û îffetê wekî taybetîyên kurdekî îdeal têne raçavkirin.

Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn ji alîyê beytbêj û dengbêjan ve hatîye parastin û heta roja me ya îro hatîye. Ji gelek deverên cuda û ji hev cihê ev destan hatîye tomarkirin û belavkirin. Niha di destê me da gelek varyantên cuda yên vê destanê hene. Ji îro şûn da peydakirina varyantên nû mumkîn be jî gelek zehmet e. Di derbarê hemî varyantên hatine berhevkirin da tiştê pêdivî ew e ku divê ev hemî varyant bêne lêkdan û ji wan metneke têkûz bête diristkirin. Divê ev metnê têkûz ê dê bête çêkirin da hemî hûrgilîyên cuda û epîzod bêne paraztin. Bi vî awayî em dikarin metnekî nû û berfireh amade bikin û bixin di xizmeta xwendevan û vekoleran.

## Jêder

### Berhem:

Açar, C. (2019). *Safevi Kroniklerinde Dımdım Kalesi Kuşatması ve Emir Han Bradosti*. İstanbul: Avesta.

Aktaş, Ş. (1998). Edebiyat Teorisi Üzerine. *Türkiye Günlüğü*, 49 (Ocak-Şubat), 87-91.

Bazîdî, M. M. (2010). *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* (ber. Zîya Avci). Stenbol: Weşanxana Lîs.

Çıkla, S. (2012). Şiirde 'Tema' Kavramı Üzerine. *Yeni Türk Edebiyatı Dergisi*, (6), 71-86.

Feqiyê Teyran, (2014). *Divan∞Dîwan*, Kadri Yıldırım (çev.), Ankara: Kültür ve Turizm Bakanlığı.

Gündüz. T. (2008). Sefeviler. *DİA* (35/451-57). Ankara: TDV Yayınları.

Hassanpour, A. (1995). Dimdim. *Encylopedia Iranica* (Vol. VII, Fas. 4, pp. 404-405). London-Boston: Routledge & Kegan Paul.

Kaplan, Y. (2022). Helsengandinek li ser Cureyên Vegêranê yên di Folklora Kurdî da (Destan, Beyt û Vegêranên Strankî). *International Journal of Kurdish Studies*, 8 (2), 273-292.

Kaplan, Y. (2019). *Destana Kela Dimdim û Xanê Lepzêrîn*. İstanbul: Nûbihar.

Karasoy Y. (1991). Destan Kavramı. *Milli Folklor*, (10), 37-42.

Karataş T. (2001). Tema. *Ansiklopedik Edebiyat Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Perşembe Kitapları.

Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Sadinî, M. Xalid (2012). *Feqiyê Teyran: Jiyan Berhem û Helbestên Wî*, İstanbul: Nûbihar.

Nêrweyî, E. T. (2019). *Emîrxanê Lepzêrîn û Kela Dimdim*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Zîlan, R. (2015). Lêkolînek li ser Kela Dimdimê. Ramazan Pertev (ed). Di *Edebîyata Kurdî ya Gelêrî* (189-220). Stembol: Avesta.

**Beytbêj:**

Ebdulqadirê Gwîzereşî (Ebdülkadir Kızılkaya): Xelkê gundê Gwîzereşê (Cevizli) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê (Hakkâri). Ji 70 salîyê borîye. Ji bilî Kurdî, Tirkî jî dizane. Xudan bîr û hafizeyeke gelek bi hêz e. Niha li Culemêrdê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 96 dq’yî da vegotîye.

Sadiqê Şetinisî (Sadık Yılmaz): Xelkê gundê Şetinîsa Jorî (Yukarı Kayacık) a girêdayî Culemêrgê ye. Di vegotina destan û serhatîyan da destekî bilind hebû. Di sala 1994ê di 54 salîya xwe da çûye ber dilovanîya Xudê. Wî, ev destane di kaseteke 92 dq’yî da vegotîye.

Ebdulkerîm Zawîteyî (Abdülkerim Akar): Xelkê gundê Zawîte (Kayalık) ye ya ser bi navçeya Çelê (Çukurca) ya girêdayî Culemêrgê. 53 salî ye. Ji Mudîrîyeta Çandê ya Culemêrgê teqawid bûye. Lîse (amadeyî) qedandîye. Wî, ev destan di kaseteke 84 dq’yî da vegotîye.

Ehmedê Bayî (Ahmet Coşkun): Xelkê Gundê Bayê (Bay) ya ser bi Culemêrgê ve ye. Di sala 1997ê da di 65 saliya xwe da çûye ber dilovanîya Xudê. Wî, ev destan di kaseteke 45’yî da vegotîye.

Ehmedê Asmînê (Ahmet Şen): Xelkê gundê Hirkaşê (Kınıklı) ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê ye. Sala 2021ê ji 90 salîyê borî wefat kirîye. Wî, ev destan di kaseteke 30 dq’yî da vegotîye.

H. Ebdilayê Keleş ( Abdullah Demir): Xelkê gundê Marifanê (Kurudere) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. 73 salî ye. Lîse qedandîye. Mudîriyeta Perwerdeya Mîllî ya Culemêrgê teqawid bûye. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 44 dq’yî da vegotîye.

Leşker Şîvişkî (Leşker Demir): Xelkê gundê Şîvişk ( Kavaklı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Derdora 60 salî ye. Di Mudîriyeta Îtfaiyê ya Belediya Culemêrgê dixebite. Niha li Culemêrgê niştecih e. Wî, ev destan di kaseteke 15 dq’yî da vegotîye.

Selîm Peyanisî (Selim ? ): Xelkê gundê Peyanis (Geçitli) ye ya ser bi Culemêrgê. 68 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyariyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 14 dq’yî da vegotîye.

Seyyîd Omer Kelêtanî (Ömer Demir): Xelkê gundê Kelêtanê ( Taşbaşı) ye ya ser bi Culemêrgê. 77 salî ye. Li gundê xwe niştecih e û bi cotyarîyê ve meşxûl e. Wî, ev destan di kaseteke 12 dq’yî da vegotîye.

H. Îskenderê Biyadirî (İskender Akar): Xelkê gundê Biyadir (Narlı) ye ya ser bi navçeya Çelê ya girêdayî Culemêrgê. Di 2021ê piştî temenekî nêzîkî 100 salî wefat kirîye. Wî, ev destan di kaseteke 5 dq’yî da vegotîye